

## DENGDÊRÊN HÊJA,

ez ji we bawer dikim û spas dikim! Ji ber ku hûn in ku tiştan didomînin. Li ser kar. Di malbatê de. Li cîh. Hûn hêza welatê me ne.

Lê ji bo ku hûn bikarin karê xwe bikin, divê siyaset karê xwe bike. Tiştan bi durustî binav bike, pêk bîne û pirsgirêkan çareser bike. Bi beralîkirin û pêbawerî.

Ji bo avhewaya ewle. Ji bo aboriyeke bihêz ji paşerojê re. Ji bo jiyanek bi arzanî. Ji bo dewletek ku têde tiştan bi hêsanî dixebitin. Ji bo aştiyê di azadiyê de.

Bihêlin em paşerojê bixin destên xwe!

Ez ji bo vê yekê têdikoşim. Ne tenê heta 23'ê Sibatê, lê heta ku hûn, hemwelatiyan, vê bixwazin.

Ez li ser wê soz didim we.


**Robert Habeck.**
***Mirovek. Peyvek.***

### 1. BAWERIYA WE BI GOTINA ME HEBE

## JIYAN.

Divê her kes bikaribe dîsa debara jiyana xwe bike! Ji bo vê yekê, divê bihayan di jiyana rojane de dakevin. Û em di heman demê de li ser parastina avhewayê jî wisa difikirin ku ew bi cizdanê her kesî re têkildar e. Kesk û erzan em dest di dest de bi hev re dimeşin!

Me enerjiya xwe paqij kiriye, niha jî em ji wê re bihayek kêm a bêhempa pêşkêş dikin! Ji bo bidestxistina vê yekê divê bacên li ser elektrîkê û xercên torê bên kêmkirin.





Deutschlandticket hatiye ji bo ku bimîne! Gihîştina ji xala A ji bo xala B divê hêsan û erzan be û em hewil didin ku bi mîlyonan mirov bikarin ji vir û pê de jî vê azadiyê kêf bikin û bijîn.

Divê xercên xanî ji asta normal derbas nebe! Em ê îstîsnayên ji frênkirina bihaya kirêyê de rakin, avahîsaziyê erzantir bikin û xaniyan dîsa erzantir bikin.

### 2. BAWERIYA WE BI GOTINA ME HEBE

## ALMANYA.

Divê Almanya dîsa were xebitandin! Em dixwazin bi reformên ku berê hatine paşguhkirin an astengkirin re mijûl bin. Ji bo vê mebestê, em dixwazin frêna deynan nûjen bikin û ji bo hukûmeta federal, eyalet û şaredariyan fona Almanyayê ava bikin.





**Fona Almanyayê ji bo fînansekirina tiştên ku Almanya bi lez hewce dike:**

- Zarok pêşeroja me ne. Ji bo wan em navendên lênêrîna rojane û dibistanan nûjen dikin û qadên fêrbûnê vediguherînin qadên jiyanê, ango cihên ku mirov lê bijîn û fêr bibin.
- Hejînî û azadiya tevgerê ji bo her kesî maf e. Ji bo bidestxistina vê yekê, em ê bi milyaran veberhênanan li binesaziyên wekî otobus û trênan û tamîrkirina pirên hilweşiyayî de bikin.
- Binesaziya dîjîtal a Almanyayê bi lezgînî hewcedarê nûvekirinê ye. Ji bo ku em bigihîjin vê yekê, em înterneta bilez tînin her deverên welêt.

gruene.de

Tevlî Tîma Robert bibe!

## BI ME RE TÊKILÎ DAYNE


*BÜNDNIS 90/DIE GRÜNEN*
Bundesgeschäftsstelle
Platz vor dem Neuen Tor 1
10115 Berlin
+49 (0) 30 28442-0
info@gruene.de



V.i.S.d.P.: BÜNDNIS 90/DIE GRÜNEN | Annkathrin Schäfer | Platz vor dem Neuen Tor 1 | 10115 Berlin

### 3. BAWERIYA WE BI GOTINA ME HEBE
## EWROPA.

Ewropa mal û pêşeroja me ye! Ewropa bersiva me ji êrîşên Vladimir Putin re, lêgerîna Ji Xing Ping ya ji bo desthilatdariyê û "Pêşî Amerîka"ya Donald Trump´ê ye. Tenê heger em bi cîranên xwe re tevbigerin, em dikarin aştî û azadiyê misoger bikin.

Ewlehiya me tê tehdîtkirin - ji derve û hem jî ji hundir ve. Ji ber vê yekê em girîng dibînin ku ewlehiya Ewropayê xurt bikin. Û bi heman yekîtî û hevkariyê em li hember dezenformasyonên ku dixwazin bikevin nav civaka me û lawaz bikin, radiwestin.





Divê civaka Ewropî bi koranî xwe nespêre welatên din! Ev bi taybetî xeternak e dema ku dor tê ser madeyên xav ên girîng an hilberên girîng ên wekî derman, wekî ku salên dawî wê yekê nîşan da. Bi bernameyek veberhênanê ya mezin, em hêzên kolektîf ên tevahiya parzemînê digihînin hev - ji bo avakirina aboriyek bihêz û xweşgûzeraniyeke ewledar.

### 4. BAWERIYA WE BI GOTINA ME HEBE
## AVHEWA.

Tekoşîn li dijî krîza avhewayê û parastina jîngehê! Ne ji bo avhewayê, lê ji bo mirovan: Ji bo zarokên me û zarokên zarokên me, yên ku dê sibê bi vê gerstêrkê ve girêdayî bin mîna ku em îro pê ve girêdayî ne.



Enerjiyên nûjvebûyî serkeftin-serkefitin-serkeftinek e: ew erzan û paqij in û me ji otokratan serbixwe dikin. Me berfirehbûna wan bi leza rekordê bilez kiriye. Û em ê vê helwêstê bidomînin da ku em bikaribin xweşgûzeranî û azadiyê biparêzin û berfireh bikin. Bêyî ku armancên xwe yên avhewayê bixin xetereyê de!

Li cîhanê gelek zêde plastîk tê hilberandin û hindik jî ji wê tê vezîvirandin: rêjeya salane ya bermahiyên plastîk dê heta sala 2050´an hema hema du qat bibe. Em dixwazin û pêdivî ye em vê yekê bidin sekinandin!

Xweşgûzeranî û qalîteya jiyanê bi awayekî ji hev neqetayî bi xwezaya saxlem ve girêdayî ne. Xweza di şerê li dijî krîza avhewayê de hevalbenda me ya herî baş e. Em daristan, ax, derya û çeman diparêzin da ku ew bikarin me biparêzin!

gruene.de

